

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (112)* *Sal 20 Tîrmeh 2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*


## Komkujiya Pirsûsê.. Kî Berpirsiyar e?

▪ **Merwan Berekat**

Komkujî û kiryara terorîst a ku di 20. 07. 2015an de li navenda çand û hunerê li bajarê Pirsûsê ji aliyê xwekujekî de hatibû kirin, û di wê de 32 ciwan şehîd bûbûn û bi dehan jî birîndar bû bûn, kî ji ber ve berpirsiyar e?

Piştî ku Yekîneyên Parastina Gel, bi hevkariya Pêşmergeyên Herêma Kurdistanê û Hevbendiya Navdewletî bi hêza xwe ya ezmanî bajarê Kobanê û gundewarên wê ji çeteyên Da`iş rizgar kirin, serê pir aliyên ku naxwezin gelê Kurd xwe û herêmên xwe ji teror û wêrankirinê biparêzin, bi rêbazên curbecur, bi dizî û eşkere nerazîbûna xwe nîşan dan, li ser serê wan jî dewleta Tirkiyê tê. Lê piştî ku Girê Sipî(Til Ebyed) jî hate rizgarkirin, asta wê nerazîbûn û çavsoriyê li ser ekranên TVyan bilind bû, ta komkujiya roja 25ê meha Pûşberê li bajarê Kobanê û gundên wê bi destên çeteyê Da`iş çêbû. Lê dîsa jî, çavsoriya wan xêrnexwez û destqulên bi Da`iş re ko ne bû, her ……... ❷



" Xelik li şûna Komkujiya Pirsûsê matmayî mane "

## Lidarxistina çelê Pakrewanên Navenda "Meyselûn" a Tendurustî LI Qamîşlo

Li roja Înê 10/7/2015an, bi sazkirineke hevbeş ji hêla pênc partiyên kurdî de, çelrojiya pakrewanên Navenda Meyselûn a tendurustî li bajarê Qamîşlo hat lidarxistin. Gelek serkirde û endamên partiyan, malbatên pakrewanan, çalakvanên Siyasî û rewşenbîrî û nûnerên komeleyên civakî lê beşdar bûn. Du şande, yek ji P.Pêşverû ya Demokrat a Kurd li Sûryê û ya din ji P.Yekîtî ya Demokrat .... ❼

## Rewşa xwendinê li herêmên Kurdî!

▪ **M.Elî**

Li salên pêşîn, û li hemî bajar, bajarok û gundên herêmên kurdî li Sûryê, bi sed hezaran keç û kur ji her sê astên xwendinê, seretayî, amadeyî û navendî, diçûn dibistanan, xwendina xwe dikirin û hêviyên siberojan ji xwe, ji dê û bavên xwe û ji welatê xwe re ava .... ❺

**Komkujiya… Dûmahîk**

yekî ji wan bi şêwakî deng bi xwe xist, ta ku li Sirûcê jî, xelekek li zincîra teror û kîndariyê zêde kirin.

Di roja ev komkujiya xwînî û hovane de, rayedarên Tirkiyê ew kiryar bi terorê nav kirin, û yekser ew xistin stiwê Da`işê, lê di heman demê de jî, nîşan didan ku herêmeke parastî ji aliyê Tirkiyê ve, û li seranserî sînorê bakurê Sûriyê, nemaze li sînorê herêmên Kurdî pêwîst e,??! Lê tiştê ku zêdetir seyr e, hinan ji wan rayedaran hewil didan ku berpirsiyariya vê komkujiyê têxin stiwê Yekîneyên Parastina Gel, ji ber ku ew nikarin sînor biparêzin!?

Piştî serkeftinên hêzên Kurdî li eniyên şerê bi çeteyên Da`şê re, berî hemû aliyên ku li ser erdê şer dikin, û yên ku destêwerdana wan di kirîza Sûriyê de hene, rayedarên Tirkiyê ragihandin û gotin: Em nahêlin Kurdistanek li bakurî Sûriyê ava bibe. Tevî ku aliyek ji tevgera rêzanî ya Kurdî li Sûriyê nîne, ku doza Kurdistaneke serbixwe li bakurê Sûriyê dike??!

Ji destpêka kirîza Sûriyê de, hefteyek bê kuştina sivîlan bi guleyên leşgerên Tirkiyê li ser sînor derbas nabe, û bê ku lêpirsîn ji bo sedemên wê bibe, eger bibe jî, bersiv; parastina sînor e?? Lê çima di dirêjiya vê kirîzê de, terorîstekî Da`işê bi guleyên wan leşgeran nehatiye kuştin..?

Ji aliyekî din ve, berî komkujiya bajarê Sirûcê, serkirdeykî leşgerî yî Emrîkî dibêje, şerê bi Da`iş re wê çend nifşên din jî bajo. Ev tê wateya ku Hevbendiya Navdewletî ya bi serkêşiya Emerîka ji bo şerê Rêxistina Dewleta Îslamî ya tundrew û terorîst bi salan dê li ber xwe bide. Eger birastî wisa be, ev rêxistina ku dijîtiya şaristanî û mirovatiyê dike, û roj bi roj ne tenê di herêma Rojhilata Navîn de, lê belê sînorên herêmê jî derbas kirine û gol vedaye, ewê pir sînorên din jî derbas bike, dê hovîtiya xwe berdewam bike û komkujiyên ji ya bajarê Pirsûsê mezintir jî bike. Ji ber wê jî, eger civaka navdewletî bi tundî û di demeke nêzîk de, vê rêxistina terorîst, ne mirovatî û hovane ji kokê de raneke, metirsiya wê li ser hemû gelên cîhanê heye. Û beşekî mezin ji berpirsiyariya van kiryarên xwînî yên ku ji aliyê Da`iş û rêxistinên wek wê ve tên kirin, dikeve stiwê civaka navdewletî.

Ji bo ku em dadwer bin, û her tiştekî nexin stiwê filan alî û bêvan alî, divê em a xwe Kurdan jî nîşan bidin. Bêguman nelihevkirin û neyekrêziya me, deriyên lawazbûnê zêde dikin. Ew dihêle ku pirtir derfet bi destê xêrnexwez û dijminên gel û doza kurdî kevin. Ji aliyekî din ve, divê em di wê baweriyê de bin, ku her em nêzîkî armancên gelê xwe bibin, ewqas neyar û xêrnexwezên Kurdan dê çavsor bibin û wê bi hemû rêbazan pîlanan bigerînin. Di vî warî de dîroka me pirmînak e, ji ber wê jî zor pêwîst e ku em sûdê jê bigrin, û pirtir hajî xwe û doza xwe hebin.

# Rêvebiriya Xweser Stiriyê Çavên Şofenîstan

**▪ Memê Alan**

Weke ku em tev dizanin, kurd ne ji dûr û ne ji nêzîk di ber kirîza ku li Sûriyê çêbûye de berpirsiyar in. Herweha destê kurdan di anîn û geşepêdana hêzên terorîst ên bi navê îslama siyasî de jî tunebû. Lê, piştî peydabûna ev rewşa kambax û kirêt ji nearamî, malwêrankirin, kuştin, koçberî û serberdayetî li Sûriyê, hemî pêkhateyên wê, Kurd jî di nav de, neçar man ku li rê û derfetên xweparastin û xwebirêvebirinê- ji bo berdewambûna jiyana xwe- bigerin.

Gelê me yê kurd û tevgera wî ya Siyasî piştî dan û standinek dûr û dirêj û ji ber gelek sedemên navxweyî û derveyî, nikanîn bighîştana nêrîn û pirojeyeke hevbeş, ev jî kêmanî û neberpirsiyariya me bû. Em niha ne li wê ne, ku em qisûr û sedemên nelihevkirinê bijmêrin û şirove bikin. Heyama neyênî ya tevgera siyasî li herêmên kurdî li Bakurê Sûryê hîşt ku rêvebiriya xweser ji aliyê Tevgera Civaka Demokratîk de û ne bi awakî hevbeş li sê kantonan (Efrîn, Kobanê û cezîrê) were ragihan.

Rast e me wek Kurd dixwast ku ew ragihandina bi hev re ba, lê nebû û hesabê sûkê li sandiqê nehat. Yanê him aliyekî siyasî kurdî bi tena xwe ew ragihand û xwedî lê derket, him jî- li gora dîtina aliyê din a tevgera kurdî- ew ne pirojeke netewî kurdî ye, lê dîsa jî ........ 11

**Em ji gelê xwe û hêzên wî yên siyasî dilniyaz in, daku li hember hêzên xinan yekrêz bin.**

## Daxuyanî
## Ji bo raya giştî

Li roja duşemê 20/7/2015an li bajarê PIRSÛSÊ (Sirûc) ku li nêzîk sînorê Tirkiyê-Sûryê ye û bi ser wîlayeta Urfa ve ye, teqîneke Têroristî di nava bi sedan keç û xortan de çêbû û di encamê de bi dehan Şehît ketin û bêtirî sedî jî birîndar bû. Ew xortina endamên saziyên civakî bûn, û ji gelek bajarên Tirkiyê hati bû, mîna Stembûl, Enqre, û ji hemî pêkhateyan Komara Tirkiyê bûn. Ew Gêncina piştgirên Kobaniyê bûn, bi karekeî pak radibûn û dixwastin destê wan jî di avakirina Kobaniyê de hebe. Wan destên têror û qirêj berî çend heftan tewankariyeke wilo li Kobaniyê jî kir û di encamê de dîsa bi sedan qurbaniyên bêguneh şehîd ketin.

Bi vê bûyerê, dîsa berê xelkê bi ser dîroka xwînî ya rêxistina Daişa çû. Ermanaca wê rêxistinê ew e, zor kurdan bibe û vîna wan di jiyaneke azad û bi rûmet de têk bibe.

Daiş di bin navnişana olî de ji hêla alîne herêmê de tê tîmarkirin. Ew alî jî pêkol dikin, ku astengan dînin pêşiya kar û xebatên avakirina Kobana xopan, û wek tolhildanekê ye jî ji têkçûna wan re li ser destê şervanên Kurd ji YPG-YPI û hevbeşên wan di odeya karnava ``Birkan El Ferat`` de, ewên ku di ber azadî û rûmeta mirov de avsaneyên lehengî û canfîdahiyê nivîsandin.

Em ev kiryara têrostî yê xiniz ji salixên Daişê ye û em wê şermezar dikin. Em ji dil de serê xudiyê şehîdan jî xweş dikin û rihetbûnê ji birîndaran re dixwazin. Em niyaz û dilxwaziyê jî ji bo hemî kesên ku ji ber nirxên azadî û aştiyê ve dixebitin hêvî dikin.

Banga me ji gel û hêzên me yên siyasî re, daku li hember hêzên tarîtî û xinaniyê rêzên xwe bikin yek, ji ber ku ew hêzina dixwazin hêviyên hemî gelên herêmê biprçiqînin. Hêviya me ew e jî, ku berpirsyariyên fermî li Tirkiyê, zû tewankaran nas bikin û bidin dadgehê.

**21.07.2015**
**Komîta Siyasî ya**
**Partiya Yekîtiya Demoqrat a Kurd li Sûryê.**



" Dê Mîstora "

## Li Benda "Nexşeya" Dê Mîstora!

**Rozad Elî**

Piştî ku pêşniyara rêzdar Stîven Dî Mêstora ji bo rawestina şer li Helebê bi ser neket, ew ji sê mehan de tevgereke nû li derbarê rewşa Sûryê digerîne, û di navbera paytextên pêwendîdar û gelek paytextên Ewrupî de diçe û tê. Armanca wî ew e, ku şerê li Sûryê dibe rawestîne û çareke siyasî ji qeyrana wê re bibîne.

Ji bo nîgarkirina wêne û nexşeyeke tevahî û wekheyî ji helwest û nêrînên hemî aliyên qeyran û kefleftê re, wî li dirêjiya sê mehan piraniya aliyên rikbera Sûrî dîtin, helwest û bawеriyên wan nas kirin. Piştre li ser dewletên herêmê ku bi qeyrana Sûryê re têkildar in jî gerî, nemaze Tirkiye, Îran û Erebiya Siûdî û.. hwd.

Biryara Y.N ew e, ku Dê Mîstora li 29ê Tîrmehê raporeke tevahî pêşkêş E.E.N bike, û tê de ``nexşeke rêkê`` ji pirsa Sûryê re dîne ber destên endamên wê. Loma jî, raya giştî ya cîhanî, dewletên têkildar û li pêşî jî gelê Sûryê, çavlirê ne ku ``ronahiya dawiya tunêlê`` xuya bibe û rê li ber çareyeke siyasî ji bobelata ku ``ter û hişk`` li Sûryê daye ber xwe vebe.

Bê guman, di nava van çar salan de pir ``av meşîn`` û guhertinên leşgerî, siyasî, civakî, aborî di gelek warên dewlet û civaka Sûrî de çêbûn. Gelek mijarên ku berê di destê sûriyan de bûn û gengazî hebû ku bi destê wan bihatana çareserkirin, ew niha ji destê wan derketin û ketine nav destên hin dewletan. Ji bilî ku alî û hêzine ne Sûrî û xudî ecinde û pirojeyên taybet jî derbas nava xaka Sûryê bûn û ji ecindeyên xwe yên taybet re dixebitin, mîna ((Rêxistina Dewleta Îslamî, El Qa`îdê…)). Di nava çar salan de, destên dewletên derdor jî di nava Sûryê de dirêjtir bûn û her yek ji wan, çi bi sazûmanê re û çi bi hêzên rikberê yên çekdar û neçekdar re pêwendiyên gumandar girê didin li gora berjewendiyên xwe dixebitin. Ango roja îro pirsa Sûryê ta radeke bilind ji destê Sûryan derketiye, ketiye destên dewletên dûr û nêzîk, ............

4

## Li Benda … Dûmahîk

bûye ``girêkeke kor`` û aloz-tir bûye.




Lê li hêleke din, li vê dawiyê, egerine nû û giring derketin meydanê, guman ew e, ku bandoreke wan e erênî wê qeyrana Sûryê re tê de hebe. Hinek ji wan egeran li hundir Sûryê çêbûne û hinek jî bi pêwndiyên navdewletî yên ku nû peyda bûne ve girêdayî ne. Ew hemî jî hêviyekê, ra biçûk be jî, li ba mirovê Sûrî çêdikin. Em kanin çend guhertinên erênî yên sereke wiha bibîr wînin:

-Her du aliyên şer û qeyranê, ango sazûman û rikbera Sûrî û piştgirên wan jî, gihane wê baweriyê ku aliyek dê nikani be di warê leşgerî de bi ser keve, loma jî piraniya wan dibînin ku çareseriya rast û durust wê bi riya guftûgoyan be. Ev jî gaveke giring e di lêgerîna ji bo çareseriya siyasî de.

-Piştî xortbûna rola ``Daiş û Qe`îdê``li ser xaka Sûryê, û dijberiya wan bi hêzên rikbera Sûrî ya resen re eşkere bû, û xuya bû ku ew ji bo rêbaz û êdiyolciyeke ne sûrî şer dikin, wê lomê rikbera Sûrî, çi siyasî û çi leşgerî, ji paşeroja xebata xwe bi tirs bûne, û roja îro ew jî li çareseriyeke siyasî digerin û amade ne ku bi Dê Mîstora re alîkar bin.

-Pirsa rêxistinên têrorist ên mîna Daişê, ji dewletên Rijhilata Navîn, Ewrupa, Emerîka û ji seranserî cîhanê re bûye metirsiyeke rastîn. Loma jî, rakirina wê ji meydanê, bûye pirseke navdewletî ye mezin û li ser her masekê tê dîtin. Lê taku dawî li wê were, gerek e şerê li dijî wê, ji Sûryê û Îraqê de dest pê bibe. Ew jî di rewşa Sûryê ya şerê navxweyî de wê ne gengaz û ne jî serkeftî be. Wê ûştê jî, wek destpêk, gerek e çareseriya siyasî li sûriyê dest pê bibe, û eniyeke hevbeş li dijî Daişê bi destê sûriyan were avakirin. Ev jî wê ne gengaz be, eger ``desteyeke destlata veguhêzok`` li gorî belgenameya Cinêv(1) li seranserî Sûryê peyda nebe.

-Vegera Îranê li civata navnetewî hêzekê dide çareserkirina gelek pirsgirêkên herêma Rojhilata Navîn, di nava wan de pirsa Sûryê jî heye. Di vî warî de nîşanên erênê ji Rûsya jî dertên, wekî ku sebra rûsan jî nema ye, û tirsa Daişê ketiye nava wan jî. Bêguman, pêwendiyên Îranê û Rûsya bi sazûmana Sûryê baş kûr in, û destê wan wê di dîtina çareseriyan de jî dirêj û hikardar bin.

-Rewşa siyasî li Tirkiyê jî hate guhertin. Eger destê Hikûmeta Partiya AKP di Sûryê dirêj bû û serberdayî dilivî, piştî hilbjartinê dawîn û encamên ku jê peyda bûne, siyseta Tirkiyê ya gurkirin û tûjkirina hinek aliyên rikbera Sûrî, dê wek xwe nemîne û were guhertin. Nemaze jî di bin zextên Emerîka û lihevkirina wê bi Îranê re, û guhertinên tevahî ku li Rojhilata Navîn pêk tên. Tirkiyê û dewletên destêwerdar ên din, mîna Erebiya Siûdî û bilî wan, ew jî neçar in ku helwestên xwe nerm bikin û bibin kirdene [عامل] alîkar û erênî ji çareseriyên siyasî re li Sûryê û bilî Sûryê jî.

-Sazûmana sûrî bi xwe jî zane ku gihaye deraqekî pir lawaz, û nikane ji vê bêtir berxwe bide û hêzên rikberê têk bibe. Lewre ew jî neçar e ku li xwe vegere û helwestên xwe nerm bike. Çinkî, eger wilo neke, û bi çareseriyeke siyasî qeyîl nebe, ne tenê sazûman û ``serê wê``, lê belê hêrsa rêçoltiya[taîfî] olî ku li Sûryê bilind bûye, wê ji (Elewiyan) re bibe metirsiyeke mezin.

Bi rastî, gelê Sûryê li bendê ye, û bi hêvî ye, ku tiştekî erênî ji westan û xebata rêzdar S. Dî Mêstora derkeve. Banga gelê sûrî li hemî kesên aştixwaz e, ku katekê pêşde şerê qirêj rawestînin û dest bi hûnandina çareseriyeke aştiyane, dadmend û demokratîk bikin. Yan jî gelê Sûryê wê bibe pezê di devê gur de, û Sûrya jî wê ji rêxistinên têrorîst mîna Daiş re re bimîne meydana kuştin, talan û wêrankirinê.

**Rewşa xwendinê ... Dûmahîk**

dikirin. Bi hezaran jî, keç û xortên li zanîngehên Sûryê û li welatên biyanî xwendina xwe dikirin û fêrnameyên bilind di hemî warên zanînê de bi dest dixistin. Piraniya xelkê me yê Kurd, xwendina zarokan wek erkekî netewî didît û hîn jî wilo ye. Ew di vî warî de şîretên zanayên xwe digirin û dibêjin ((bê xwendin û zanîn milet bi ser nakevin)). Ew jî rastiyeke dîrokî ye, berê, îro û sibe jî rast e û di cih de ye .



Lê mixabin, di rewşa qeyran û bobelata Sûryê de, bi taybetî jî di van du salên dawîn de, wekî çawa gelek warên jiyan û civaka Sûrî wêran bûne, rewşa xwendinê jî ziyaneke pir mezin û giran dîtiye.

Li gora gelek serhjmaran, di nava çar salan de, bêtirî du milyon keç û kurên Sûrî ji xwendin û perwerdeya hemî astan bêpar bûn û derfetên bidestxistina xwendinê ji dest çûne.

Rewşa xwendin û dibistanan li herêmên kurdî jî ji navçeyên Sûryê yên din ne çêtir e. Ew jî bi agirê qeyrana Sûryê dişewite û wêran dibe. Di gel ku rewş li herêmên kurdî, ji bilî Kobanê, aram in, dibistan wêran ne bûne û piraniya mamoste û karbidestên perwerdeyê hîn li ser karên xwe ne, lê rewşên bê ewle, astengên jiyanê, mişextbûna xelkê, derketina ji welêt, nemana saziyên dewletê û gelek tiştên din jî, dikin ku rewşa perwerdeyî zor xirab bibe û wek me got, bi sed hezaran şagirt, xwendekar û zarokên li derveyî dibistanan bimînin, ji karê perwerdeyê dûr kevin û siberoja wan û welêt jî ji dest me hemiyan biçe.

Li deverên me yên kurdî pirsgirêkeke din jî hatiye meydanê, ew jî fêrkirina bi zimanê kurdî ye. Em tev dizanin, ku ew daxwazeke sereke û kevin e ji daxwazên gelê Kurd, û mafekî rewa û bingehîn e jî. Lê rewş û derfetên ku niha ji nişkave peyda bûn, ketina zimanê kurdî ya yekser û bê amadebaşî di dibistanan û di hemî mewadan de û hilanîna zimanên mîna Erebî, Îngilîzî… ji polên destpêkî, van tiştan hêştiye ku veciniqandin û nişkaviyeke bê amadebaşî li ba zarokan û xudiyên zarokan jî derkeve meydanê. Piraniya xelkê me dibêjin, ku hîn rewş li Sûryê bi tevahî ne zelal e, û kesek li zimanê me jî mikur nehatiye, loma zarokên me wê çawa û li kû xwendina xwe berdewam û bi serî bikin?. Sûryê di nava gergerînkeke mezin de ye, kesek nizane sibe wê çi bibe û rewş wê çawa bigerin û bi kû de biçin. Loma jî, ya çêtir ew e, ku rêbazên minhac ku berê di dibistanan de dihatin xwendin wek xwe bimînin, û mewadine din bi zimanê kurdî lê zêde bibin; mîna ``ziman, dîrok, xaknîgarî û h.w.d``. Nêrîn û daxwaza piraniya xelkê wiha ye, loma jî, gerek e kesên ku li navçeyên kurdî xudî biryar in û karnava perwerdeyê bi rê ve dibin, bi çav û dilekî vekirî li nêrîn û bawriyên xelkê xwe binêrin û wan pişguh nekin. Ji ber ku biryara dawîn gerek e ya xelkê û dê û bavê zarokan be, çinkî partî, rêbertî, êdyolocî û hemî tiştên din diçin, lê gel dimîne. Paşeroj ji wî re ye û di destê zaroyên wî de ye, gerek e çêkirina wê û avakirina welêt jî di destê wan de be.

Di vî warî de, ne veşartiyek e em bêjin, ku beşekî mezin ji kesên ku welêt berdidin û bar dikin, xwendina zarokên xwe wek behane dibînin, û siyaseta perwerdeyî ya ``rêberiya xweser`` jî wek sûc û sebeb didin xuyakirin.

Gerek e di van rewşên dijwar û awarte de, ji bo bedestxistina xwendin û zanînê, çi ji destê me derkeve em bikin, zarokên me bi çi zimanî diwxînin bila bixwînin. Bila em di pirsa perwerdeyê de nelezînin û xwe şaş nekin. Ji ber ku zaroyên me û paşeroj wan berdêlê didin, ew jî siberojê dixe nava mij û dûmanê.

# Mîşêl Kîlo Jî Deng Bi Xwe Xist

▪ Şêrwan Berekat

Tu kes nikare derewan li dîrokê bike, ne jî kare rastiya gel, welat û hebûna wan li gor mejiyê xwe bincil bike, ji ber ku dîrok ji tu kesî fedî nake, û ne jî xewnên derewîn di tomargeha xwe de datîne.

Di dirêjiya dîroka Kurdistanê û nemaze di ya nûjen de, dagîrkerên şofen bi hemû rêbaz û pirojeyên xwe yên nijadperest hewil dane û hîn jî berdewam in, ku rastiya Kurdistanê ya dîrokî biguhêrin, lê ta roja îro jî, sextekariya wan bi şoreş, serhildan û xebata tevgerên rêzanî yên Kurdî beravêtî dibin.

Rast e; li ser xaka Kurdistanê gelek imberetorî hatin û çûn, û her yekê ji wan beşek ji şaristaniya xwe li ser ava kir, lê ew tenê ji aliyê leşgerî û kargêrî ve dagîrker bûn, ango hertim niştecihên Kurdistanê Kurd bûn.

Li aliyekî din, ji zincîra çiyayên Zagros de ta derya Sipî, di serdemine dîrokî yên dirêj de û li ser xaka xwe ya dêrîn, Kurd xwedî imberetorî û şaristanî bûn. Ma gelo dîroknas dikarin Somerî, Horî, Mîtanî û Mîdiyan ji sîngê dîroka Rojhilata Navîn rakin? Wekî çawa di seranserî dîrokê de, herweha di dîroka xwe ya nûjen de jî, tucarî gelê Kurd dijîtiya gelên hevsînorê Kurdistanê nekiriye, û ne jî bi çavsorî li rastiya wan û welatê wan mêze kiriye. Ev jî, ji bo gelê Kurd serbilindî û şanaziyeke dîrokî ye.



" Mîşêl Kîlo "

Serê kê bêşe bila bêşe, ew ne qisaweta me ye, kî jî çi dibêje bila bêje, eger ew di agirê nerazîbûna xwe de bişewitin jî, lê ***Kurdistan welatê me yê dîrokî û netewî ye***. Bila her kesek jî bizanibe, ku mejiyê gelê Kurd aştiyane û hezkiriyê mirovatiyê ye, ew ne şofenîst, nijadperest û kîndar e, bersiva vê rastiyê li cem pêkhateyên ku îro di herêm û di nav civaka Kurdî de dijîne.

Biborînin; wekî çawa hirç bi pirçê mezin nabe, herweha mejiyên ku bingeha wan sextet be, ew pir zûka eşkere dibin. Ev gotin li ser pir rewşenbîrên ne Kurd ên ku xwe wek dostê gelê Kurd nîşan didan cêbicê dibe. Pir ne pêwîst e ku em navên wan rêz bikin, û careke din wan li bîra gelê xwe wînin. Lê hin jî hene ta berî demeke kurt, Kurdan bi nêrîneke mezin li wan dinihêrî, û birastî ew dostê doza Kurdî didîn. Lê mixabin kirasê wan xapînok bû.

Piştî Girê Sipî hate rizgarkirin, çav li dewleta Tirkiyê sor bûn, hin hêzên xwe yên leşgerî berve sînorê Rojavayê Kurdistanê têvedan, û herweha hemû neyar û xêrnexwezên gelê kurd qêrîna kîndariyê bi xwe xistin, û ta niha jî netebitîne.

Di dema ku hêzên leşgerî yên Tirkiyê li nêzîkî sînor cî girtin, û Hemahengiya Sûrî li Stembolê pêkolên nerazîbûna xwe ji serkeftinên hêzên Kurdî dikir, li Entabê ( Dîlok ) rewşenbîrê ku doza demokratiyê dikir ( Mîşêl Kîlo ) jî ew kiras bi aliyekî de avêt, qîrîna nijadperestiyê bi xwe xist û got: *Gelê Sûrî nahêle Kurdistan li bakurê Sûriyê were avakirin.*

Bêguma Mîşêl Kîlo ji hemû rewşenbîrên Sûrî yên Ereb baştir dizane, ku Tevgera Rêzanê ya Kurdî li Sûriyê tucarî doza Kurdistaneke serbixwe li bakurê welêt nekiriye, ne jî pêkhateyên di herêmên Kurdî de koçber kirine. Ew baş dizane ku Kurdan ne mizgeft û ne jî kenîse hilweşandine û şewitandine, û ne jî kiryarên terorîst kirine. Çavsorî û nerazîbûna Kîlo ji serkeftinên gelê Kurd e. Bêguman gelê Kurd pirsnîşankeke mezin li ber navê wî danî. Roj bi roj bêjinga gelê Kurd dostên rasteqîn û yên derewîn ji hev cuda dike. Lê girîngtirîn kar ew e, divê em Kurd bizanibin, ku her em ji armancên xwe ve nêzîk dibin, hemû xêrnexwzên me hewildanên lukmandina me dikin, ji ber wê jî eger me haje xwe tunebe, û her aliyek li serê xwe siwar be û yakrêziya xwe ava nekin, riyên têkbirina serkeftinên me li pêş wan dilbikînan[hesûd] vedibin.

**Lidarxistina çelê .. Dûmahîk**

lê amade bûn.

Li destpêkê, mamoste Noşîn Bêcirmanî bixêrhatina beşdaran kir, çend kîtên helbestî yên hêja û balkêş xwendin. Piştre mamoste Idrîs Şingalî ev gotina bi navê her pênc partiyan xwend:

**Gelî xwîşk û birayên hêja.. Malbatên pakrewanan..**


Em bejna xwe li ber cangoriyên şewata navenda tendurustiyê ya taxa Meyselûn ditewînin.

Di bîranîna çilrojiya cangoriya wan de, em bi dilekî xemgîn wan bibîr tînin, ji malbatên wan jî sersaxiyê dixwazin û soz didin ku emê layiqî xwîna wan bin û hemû derfetên biratî, aştî û wekheviyê bikin ta ku em bigihên rojeke pîroz ku hemû gelê Kurd û Kurdistanê bibin yek, û êş, kul û derdên xwe bi hev re parve bikin, emê hemû hewldanan bikin ku pêşerojeke bi hêvî û daxwaz li ber çavan bibînin û têkoşîn û xebatê ji wê dozê re bikin.

Careke din gelê Kurd rastî bobelateke xemgîn tê, û hemû kul û derdên wî dipişkivin di rojeke tarî de li ser bajarê Qamişlo ku bûye sembola berxwedan û serfiraziyê.

Careke din ev xwîna pak û zelal dibe sedema ku me bigihîne hev û têkilî û nerînên me nêzîk bike, ji ber ku em weke Kurd tim li ser kul û xeman dibûne yek, hêvî ew e ku berjewendiyên kesayetî yên teng li şûn bihêlin û ber bi hêviyên mezin biçin, ji bo





serbilindiya gelê me û pêşerojeke asa û aştiyane ji zarokên me re ava bibe.

Bêguman, ev bûyer pir giran e li ser dilên me û çendîn me rondik li ser canên van pakrewanan barandin, lê ta ku em li xwîna wan xwedî derkevin û soza xwe ya me daye wan pêk bînin, gerek e em yekrêziya xwe xurtir bikin, hezkirin û nêzîkbûna xwe kûrtir bikin, ta em karibin jiyaneke aram û wekhev bijîn. Ew jî wê bibe bersivek ji bo xwîna van pakrewanan û binghek ji bo aştî, biratî û hevkariya gelê me. Ji ber ku çendî em bêjin wê cîhan li ser me xemgîn be, lê nikarê bigihêje asta ku birîna me bi rengekî zelal bibîne, û xembariyê li ser wan bike, ji ber ku birîn birîna me ye û pakrewan jî pakrewanên gelê me ne, ji bo vê yekê em dubare soza xwe ji wan re nû dikin û bejna xwe li ber canên wan ditewînin.

Sersaxiyê ji malbatên wan re û ji hemû malbatên pakrewanên Kurd û Kurdistanê re dixwazin.

Bilindî û man ji navên pakrewanên me re.

dilovanî û aramî ji canên wan yên buhiştî re.

Sersaxî ji malbatên pakrewanan re.

Û serkeftin ji doza dadmend ya gelê Kurd re.

Partiyên amadekar ji çilrojiya pakrewanên bobelata nexweşgeha taxa Meyselûn re:

**P. Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî)-**

**P. Demokratî Kurdî li Sûriyê-Alpartî-**

**Tevgera Çaksazî- Sûrya-**

**P. Çep a Demokrat a Kurd li Sûrya (P.Ç.D.K.S-**

**P. Rêkeftin a Demokratîk a Kurd li Sûriyê-**

*Ragihandina rêxistina Qamîşlo ya*

*P.Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê (YEKîTî)*

# Ma Bi Rastî Ziman Dayîk e

▪ **Mihemed Qere Hesen**

Di dîroka zendegeyan[giyanwer] de hatiye tekuz û dupatkirin, ku gava guhartinên bingehîn di pêkhateyên mêjiyê mirov de çêbûne, wê hîngê ew ji jiyana ajalan dûr ketiye. Berhema wê guhartinê jî raman bû. Ramankirinê jî hêşt ku ew bi xwezayê û diyardeyên[rûdaw] wê birame û pê re têkiliyê bike, wê têkiliyê jî hêşt ku her du alî hukariyê li hev bikin. Ango mirov yek ji berhemên xwezayê yên zendege ye.

Demek pir dirêj û ne nas mirov diramî loma jî ew bi mirovê hişmend hate binavkirin. Aya berî mirov deng bikira, dihizirî, ji ber wê jî ziman ne bû raman, lê bi rêya wî xwe derbirî, herwiha ziman li vir rola emrazeke derbirîn û hevghêştinê dilîze.

Li gor têklî û jiyana mirov di heyamên suriştê de, û têkariya wê li wî, û li ber rola pêgerekî û pêwîstiyê, wî kanibû deng bikira. Gava mirov axivî, ziman afirî. Ango ziman bû berhema mêjiyê mirov. Vêca ziman zarok e, mirov dayîk e, zarok şêrîn û kezeb e, parek ji heyîna wî ya henasî û derûnî ye û jê re bûye nasnam e.

Gotina ku li ser zar û zimanan digere, û dibêje ku ziman dayîka mirov û netewan e, ev dûrî rastiya zanistiyê ye. Lê gava rol û bandora zimên bilind hate nirxandin û girîngiya wî di




pêşketina netewan de baş hate zanîn, daku payebilindiyê bidinê, ew bi dayîkê hate nimandin.

Wek nimûne, ji ber pêwîstiya zimên û rola wî, dijminê netewa Kurd zimanê wî qedexe dike, nahêle ku were xwendin, ne jî dihêşt pê were nivîsandin. Loma jî, kKurdan ji ber zimanê xwe ve qelengên pir biha dane. Ji ber ku Kurdan û neyarên wan rind zanibûn, ku ziman şana hebûna wan e, û bûye emrazek ji rizgarkirina wan re jî.

## Pênûs yek e

▪ **Ebdilrehîm Isma'îl.**

Lê nivîskar bi rengan e
Lê nivîs ji bin destan e
Wekî zan im bi beşan e
Meşa wa ser sê siran e

===============

Ê sipî ji xwe ez im
Li pey doza xwe dimeşim
Ne gav hêdî ne bilezim
Ne dûv im ez ne jî pez im

============

Ê reş ji xwe dijmin e
Ew her dijî doza min e
Divê her timî bindest bim
Ez bê welat û bê kes bim
Ez birîndar û nexweş bim
Gazinan qet ez jê nakin
Ji ber ku dijminê min e
Her timî neyarê min e

=============

Gelê min hun bi xwedê kin
Rastiyê zû bêjine min
Ê belek ji kû hatine
Rû bi rû birayê min e
Piştê didimê dijmin e
Berjewendî ser gel re ne
Ew hevalê wî kesîn e
Ew kesên berîk tije ne

============

Miletê min wilo nabe
Nivîskar bi du renga be
Hey gelê min ji xew rabe
Hinek hişmend û zana be
Tu car limêj qebûl nabe
Li pey melayê xirabe
Ger bimînin bi vî rengî

Mafê te her wê winda be

## Derfetek ji zêr

▪ **Zeredeşt mihemed**

Li welat raperîn rabû şoreşa gel va li dar e
Mizgîna felatê hatî dê berdin sitemkar e
Keç û law xwe bi xemlînin serkeftin va diyar e
Bila Dayik bi lîlînin deng belakin li bajar e
Ev şoreş derfetek zêr e kurdo jê bigire sûdar e
Lê gazin ji rêberên kurd ji hemî berpirsiyar e
Ezîtî nekin karê xwe nebin wek pepûk û jar e
De gel rabe bike qîrîn haydanê bide kedxwar e
Bi yek destî hemî rabin azad bikin gund û şar e
Dem dema rêkeftinê ye ne ya rikhev û fişar e
Roj roja yekîtiyê ye himber çete û neyar e
De bila keç bilîlînin şa bibin dildar bi yar e
Dê sazkin hêz û artêşa bi rext kin komê çekdar e
Bi yek dengî pevre bakin çarenûs bo me biryar e
Bi yek rengî ala rakin li hemî civak û war e
Da bi azadiyê tev bijîn şahî bikeve dilê jar e
15.04.2014

# Stêrkên Tora û Hunera Kurdî

■ **Fidan Abdallo**

Di mêjûya kurdî de jina Kurd roleke balkêş lîstiye. Pir nivîskar û dîrokvanan lêkolîn li Ser jina Kurdistanî û kesayetiya wê nivîsandine, pesna wê dane û li ser qehremaniya wê rawestîyane.

Bi rastî jî, eger tu bixwazî asta çanda miletekî bipîvî, divê tu rola jinên wî nas bikî.

Emê li vir nav û pênasîna çend jinên Kurd ên navdar bi bîr wînin:

-١Mestûre Kurdistanî: Ew navê wê yê hunerî ye û pê helbest belav dikir. Navê wê Mehşerefa keça Abûl Hesen Begê Qadirî ye. Di sala 1804an de li bajarê Sineyê ji dayik bûye û sala 1847an çûye ser dilovaniya xwedê.

-٢Xatûna Zerbaniya Derziyanî: Ew keça Yûsif Begê Derziyanî û dayika Şaways Qewlî ye, ku li dawiya sedsala heştem a koçî li gundê Derziyan ji dayik bûye û li wir gihîştiye. Xatûnê, ji bilî ristina helbestê di lêdana tembûrê de jî hoste û jîr bû.

-٣Xatûn Dayrekî Rezbar: Navê wê helbestvana hêja Dayrek keça Husên Begê ye, ew di sedsala sêzdehan de li bajarê Helwarê ji dayik bûye. Ew di lêdana tembûrê de jî şeraza bû û piraniya helbestên xwe bi awaz û lêdana tembûrê digotin.

-٤Nêrgiz Xanima Şarezûrî: Nêrgiz keça Mele Şikrulayê Şarezûrî ye, ew di sala 713an/ koçî de li Şarezûrê ji dayik bûye. Ew helbesvaneke navdar bû. Ji bilî helbestvaniyê di lêdana tembûrê de jî hoste bû.

-٥Nazdar Xatûna Şîrazî: Ew Helbestvana jin ku di sedsala çardehan de jîya ye, li Şîrazê ji dayîk bûye û di sala 1363an de cûye ser dilovaniya xwedê.

-٦Xatûn Meyzad: Navûdengê helbestên wê li Loristanê derket.

-٧Lîza Xanim: Navê vê xatûnê wek cewhereke şevçirayê di wêjeya kurdî de dileyze. Lîza Xanim di sedsala pêncem koçî de jiya ye. Ew bi eslê xwe ji bajarê Şarezûrê ye, lê belê maweyeke dirêj li Loristanê jiyan domandiye. Ew di lêdana tembûrê de jî sareza û hoste bû, wê helbestên xwe bi awaz û lêdana temûrê li camexane û dîwanxaneyan distira.



Peykerê Mestûre Kurdistanî

-٨Rihan Xanim Loristanî: Navê vê stêrka geş ku li asîmanê serî hildaye û di sedsala pêncem a koçî de li dorhêla Yefteko li Loristanê ji dayik bûye. Di tembûrê de jî destekî wê berz û bala hebûye. Wê di dîwanxanan de helbestên xwe dixwandin û li tembûrê dida.

Ev in çend sterkên dîroka kurdî. Û bê guman, em bi kar û xebata van jinên çalakvan, rewşenbîr, Zane û wêrek pir serbilid in.

*Jêder: Pirtûka ((Feqî Huseyn Sagunic)》*

# Taxa Şêx Meqsûd li Heleb Ne Kobanê, Cezîr û Efrîn e

■ **Q.Mihemed**

Taxa Şêx Meqsûd taxek ji taxên bajarê Helebê ye, ji berî bûyerên Helebê, piraniya nişteciyên wê kurd bûn , niha dora (20000)Kurd lê dijîn û yên din jî bi piranî birayên me yên Ereb ên ku ji taxên Helebê yên din mişext bûne ne, hinek ji Fileyan jî lê hene. Li dema niha, tax ji aliyê YPG û YPJ û hêza asayşê ve tê birêvebirin û parastin. Ji bo karguzariyê ve jî, encûmeneke xwecehî û hevbeş ji hemî pêkahateyên wê heye, ew jî bi aramî xebata xwe dike.

Ji demekê ve gizgizî û nakokî di nava rêvebiriya taxa Şêx Meqsûd û Encûmana Xwecihî ya Şoreşgerî ya taxên bajarê Helebê yên ku ji aliyê hêzên Artêşa Azad ve rizgarkirî ne derketine holê. Ji ber ku YPG û YPJ û asayîş naxwazin tu hêzên din ên cekdar li taxa Şêx Meqsûd tevbigerin. Encûmena xwecihî ya



şoreşgerî û hêzên artêşa azad jî dibêjin ku taxa Şêx Meqsûd taxeke bajarê Helebê ye û heleb jî bajarekî Sûrî ye, loma jî çênaba ku tu rêbend û kontiroline din li pêş tevgera me ya ……. 11

# Dîroka gundekî: Gundê Xirabê Reş

*Wergerandin: Mihemed Zekî Mihemed.*

*Jêder: Rûpela Fêsbûkû ya Çarçira.*

Ji devê kalemêr: Mihemedê Ebdo, ku di sala 1925 an de li gundê ('Etbê) ji dayik bûye, hîn di pêçekê de bû, hatiye gundê (Xirabê Reş) û li wir cîwar bûye, hatiye girtin.

**-Navê gund**: Tê gotin ku ji ber axa vî gundî reş e, navê (Xirabê Reş) lê hatiye kirin.

Hin jî dibêjin ku ji ber ev gund gelek caran wêran bûye û careke din ji nû ve hatiye avakirin, ev nav standiye.

paşê di pirojeya zinara erebî ya kirêt û rû reş, li sala 1963an û siyaseta erebkirinê de, navê wî kirine (Dêr Hafir).

**- Cîgehê wê yê kargêrî û xaknîgarî**: Li gorî dabeşkirina hikûmetê ji hêla rêvebiriyê ve, ew bi Qeza Çil Axa ve girêdayî ye, li gorî hikûmeta kantona Cizîrê ew bi QezaTirbespiyê ve hatiye girêdan, Xirabê Reş 22/ km an ji bajrokê Çil Axa û 26 an ji bajarokê Tirbespiyê dûr e, sînorên wê yê xaknîgarî jî ev e: Rojhilatê wî gundê Qaşto û Dêrûna Axê ye, Rojavayê wî gundê Şêtika ye, başûrê wî gundê Alaqos e, bakurê wî gundê 'Etbê û sînorê Turkyê ye, herweha ew



4/km an ji sînorê Turkyê dûr e.

**- Hozên ku di gund de hene**: Hoza Hemika, ya ku di sala 188oyî de gund damzirandiye, li wê demê gund ji (60) malî ava bû, ta niha jî hoza Hemika li wir cîwar e, paşê ji ber nîrên jiyanê yên zor dijwar jimara malbatan kêm bû.

**- Ol**: Şêniyên gund hemî mislman in.

**Giringtirîn sernavên arkolojî di gund de**: Xaka Gozel û Gola Behdê li başûrê gund in, Diyarê Nîşko jî li bakurê rojhilata gund e, herweha Merqeda (Şêx I'sma'îl) di nava goristana gund de ye, lê tu jêderên avê li gund nehatin dîtin, loma gundiyan ava bîran di malên xwe de bikartanîn, tenê robarekî berwext li Zivistanê û destpêka buharê ji ('Etbika) kevin bi aliyê gund de diherike.

**-Giringtirîn xizmetguzariyên ku li gund peyda dibin**: Bîreke irtirwazî heye, dibistaneke pîşesazî jî lê heye û riyeke qîrkirî tê gund, lê di van salên dawî de ziyan gihayê. Û ji ber herêm bi tevayî kurdî ye, ji encama piştguhkirna rêjîma Be`is ji herêmê re, xizmetguzarî bi derengî gihane gund.

**-Xaka çandiniyê**: Rûbera xaka gund a çandiniyê dora (9000) donim e, bi encama çespandina Kember Erebî ya şofen(7000) donim ji hêla dewletê ve hate desteserkirin û li Erebên (Xemrê) hatin belavkirin, yên mane arzinaniya wê li hoza Hemika vedigere. Hêja ye em bêjin, piraniya şêniyê ku niha di gund de mane ji yek malbatê ne.

**- Çandinî**: Ji kevin de ( genim - ceh- nok- nîsk- bîqya) lê dihatin çandin, lê niha (Kemûn û Gijnij "Kizbera) jî têne çandin.

**-Giringtirîn lawir**: Ji kevin de (ciwanga – hesp – hêştir (qantir) – \êlek – pez - mirîşk û balinde) xwedî dikirin, niha tenê (\êlek – pez – mirîşk û balinde) hene, karê sereke ji gundiyan re çandinî û sewalvanî ye.

**-Giringtirîn Bûyerên dîrokî**: Gund piştgiriya xwe bi dirav, cebilxane û çekan ji Pêşmergeyên Barzaniyê nemir re navdar e.

## Sûra Amedê û Baxçeyên Hewzelê Bûn ji "Kelepûra Cîhanî"

Unêsecoyê di civîna xwe ya sih û nehê de ku li 5/7/ 2015 li bajarê BONa Elmanya hatibû girêdan, biryar da ku sûra (beden,sîper) Amedê û baxçeyên Hewzelê bikevin nav lîsteya "Keletpûra Cîhanî".

Nûnerê Tirkiyê li Unsecoyê di civînê de çêre hêjaya dîrokî ya bajarê Amedê û sûra wê kir û got, ew dê bi çavdêriyeke durust sûra Diyarbekirê û baxçeyên Hewzelê biparêzin. Seroka belediya Amedê Gultan Kişanak û hevserokê wê Firat Anli jî li civîna Unescoyê ku li 28-ê Pûşberê hezîranê dest pê kir, amade bû bûn.

Dirêjiya sûrê Diyarbekirê 5700 metr e û bilindiya wê jî di navbera 13 û 17 metran de ye. rûbera Baxçeyên Hewzelê jî 700 hektar in.*(nefel.com)*

Dîroka avakirina sûrê ne hatiye zanîn, lê hinek lêkolîner dibêjin, ku ji 3000 sal de hatiye avakirin.

Sûra Amedê ji aliyê dirêjiyê de li dû Sûra Çînê tê, lê ji hêla mezinbûnê de ew pila …….

11

### Taxa Şêx .. Dûmahîk

di taxê de bisekinin. Ji bo vê pirsgirêkê gelek lihevkirin hatin îmzekirin, lê mixabin ta niha tu ji wan cîwest nebûn .

Di vê çarçewê de û li gor rewşa ku heye, divê em kurd ji bo xweparêziya xwe bi awakî aram û aştiyane pir haydar û hişyar bin, bi hestiyarî û nêzikî nêzîk pirsgirêkê bibin û çareseriyeke aştiyane di riya diyalog û danûstandinê re bibînin.

Bila em ji bîr nekin, ku ta derfetên çareserkirinê di riya danûstandinê re hene, gerek e em ji çareserkirina leşkerî dûrkevin. Jiber ku çareseriya leşkerî ji bo xelkê me yê Şêx Meqsûd pir zirar e, û li dawiya dawîn, hemî xelkê Sûryê biran e, çi Kurd, çi Ereb û çi pêkhateyên din, û gerek e jî em wê biratiyê û wan pêwendiyên dîrokî bi şweyên birayane biparêzin, û ew hêzên îslamî tim û tim çavtengiyan li Kurdan nekin.


### Sûra Amedê .. Dûmahîk

yekê distîne.

Çar dergeh di sûr de hene. Heştê û du bircên parastinê jî li ser sûr hene, ew bi berbeqan digihên hev, dirêjiya wan berbeqan jî digê şeş kîlomitran.

Sûr bi kevirên reş (bazlitî) hatiye avakirin. Kevirên wê bi cebsîn û sipîkiya hêkan bi hev ve hatine girêdan. EW şêweya avakirinê hêzeke mezin daye avahiyê û hostetiyeke avakirinê ya pir bilind jî dide nasîn.

Aliyekî sûrê li ser çemê Dîjle ye. Ew dîmenekî xweşik dide sirûştê û dilê evîndarên Amedê germ û bi kelecan dike.



### Rêvebiriya …….. Dûmahîk


ew li heza şofînîzmên Tirk ,Ereb û Eceman û bi taybetî jî li ya rijîma Turkiyê û şofenîstên rikbera Sûriyê yên ku li stembolê tevdigerin nehat. Ewan ji roja yekê de ji ragihandina rêvebiriyê, bi her awî hewildan ku wê reş bikin, têk bibin û ji holê rakin. Wan bi wê nekirin, hêzên terorist, bi taybetî jî Daiş bi ser de têvedan, bi behaneya ku xwediyê vê pirojeyê P.Y.D ye, ew jî alîgirê P.K.K ye û P.K.K jî partiyeke terorîst e (li gor dîtina rijîma Turkiyê). Tirkiyê jî napejrîne ku P.K.K li Bakurê Sûriyê û li dirêjiya dora /800/km pê re sînordar be. Mixabin, hinan ji kurdan û partiyên me jî ev propoganda derewîn rast înan kirin û ketin bin bandora wê, hinan jî xwe kirin xefka dijminên kurdayetiyê û şere ``rêvebiriya xweser`` kirin. Erê me dixwest em bi hev re xwediyê vê projeyê bin, û gelek têbîn û rexnên me jî li ser hene, lê divê em ji virên dijminên kurdan dûrbana û şerê wê nekira.

Lê di dû re û ta niha, û piştî gelek destkeftiyên mezin, û êrişên hêzên terorîst ku bi ser herêmên kurdî de hatine û bilindbûna metirsiya wan li cîhanê û serkeftinên mezin ku Y.P.G û Y.P.J li hember Daişê bi dest xistin, van tiştan bala hêz û welatên hevpeyman berve Rojavayê Kurdistanê(R.K), rê ڤpeyman berve R.vebiriya xweser û Y.P.G û Y.P.J kişand, û piştgiriya wan jê re pirtir bû, bi taybetî jî piştî rizgarkirina Girê Sipî û pevgirêdana Kobanê bi Cezîrê ve. Di vê navberê de, hewildanên rizgarkirina herêmên Cerablûsê, Munbic Bab û Ezazê ji destê Daişê û pevgirêdana Kobanê bi Efrînê re jî hate gengeşekirin. Vê yekê hîşt ku rijîma Turkiyê û alîgirên wê her biçin har bibin, û hewildanên bi dizî û aşkere li dijî R.K bikin, û Turkiyê ji hevpîvan û terezûya xwe derkeve û hêzeke leşkerî ye mezin bişîne ser sînor û nameyên bivehiyê ji Kurdan re bişîne.

Di vê rewşa nû û pir nazik de, divê em Kurd hişyar bin, dest û lingên xwe nexin ava sar û bêjin Emerîka û bilî wê jî bûne dostên Kurdan û paşerojên me bê metirsî bûye. Pêwîst e em ji ezmûnên xwe yên dîrokî sûdê werbigirin, bi roj û şev tevbigerin û alavên xwe yên berevanî û xwe parêziyê xurtir bikin û bi hev re li rêvebiriya xweser xwedî derkevin, dewlemend bikin, bi pêşxînin û kêmkasiyên ku hene ji hole rakin. Ji ber ku, dijminên kurdayetiyê ranawestin, bi şev û roj pêlanan digerînin ta ku kurdan bêşînin, ji nişka ve pê dadin û xewnên wan di dergûşê de bifetsînin. Herwa em ji bîr nekin, ku helwest û berjewandiyên navdewletî jî tim weke xwe namînin, ew jî li gor rewş û berjewendiyan têne guhertin, ango îro bi te re ne û siba li dijî te ne û belkî te bikin qurban jî.

# Evdirehîmê Rehmî Hekarî

♦ Parêzer Edhem Şêxo - *Stembûl*



*" Evdirehîm Rehmî "*

**D**ema ku mirov rûpelên zana, welatparêz û rewşenbîrên Kurd dipelîne, dibîne ku gelek zana û hozanên Kurd navên wan winda ne û mixabin di nav lawên gelê xwe de ne nasin, em karin bêjin, yek ji wana Evdirehîmê Rehmî ye.

Gelo ew kî ye? Evdirehîmê Rehmî helbestvan, rewşenbîr, rojnamevan û welatperwerekî kurd yî girîng e. Di Ansîklopediya Îslamî di cildê 44an de li derheqê wî hatiye nivîsîn û gotine ku mirovê têkoşînê ye.

Di sala 1890 li navça Elbakê ya Wanê hatiye dinê. Bavê wî Seyid Mihemed Pertewê Hekarî ye. Diya wî Emetullah Xanim e. Li Elbakê dest bi xwendina xwe kiriye û li Wanê ``dibistana mamostayan``qedandiye, demekê mamostetî kiriye, û dûv re li Enqerê li ``dibistana darayî Maliyê `` xwendiye. Zanîn û perwerdeya xwe ya Olî jî li cem Seyid Tahayê Erwasî qedandiye, destûrnameya xwe jî wergirtiye, li Stembolê di Fakûleteya Îlahîyat de xwendiye, li Stembolê di nav komeleyên Kurdan de cih girtiye û bûye endamekî jêhatî di komela – Hêvî – de, li gel Ekrem Cemîl Paşa û Hemzeyê Muksî……h.w.d. û li gel hevalên xwe dibistanek kurdî li Stembolê vekir.

Lê dema şerê cîhanê yê yekem û leşkerên Ûris ketin Kurdistanê, ew çû Kurdistanê û li hember leşkerên Ûris şer kir, lê mixabin di vî şerî de birîndar bû û esîr ket dest Ûrsê. Lê li dawiya sala 1917an, ji Kampa hêsîran revî, çû Bakuyê û demekê li Bakuyê ma. Piştre hate Stembolê û dîsa dest bi xebatê kir û bû endamê komeleya pêşketina Kurdistanê, û di vê komeleyê de di Kovara – JÎN – de dest bi weşanê kir. Ew li Stembolê bû endamê ``mala hişmendiyê ya Îslamî`` دار الحكمة الإسلامية

Yek ji xebatên wî li Stembolê nîvîsandina – Memê Alan –. Ew jî yekem şanoya kurdî ye di dîroka wêjeya kurdî de. Ev şanoya di wê demê de li Stembolê hatiye lidarxistin. Ew li wê demê li Stembolê bi neviya Bedirxan Paşa – Hîdayet Xanimê re – zewicî. Û ji ber serhildana Şêx Seîd demekê ew li Stenbolê kete hebsê jî.

Evdirehîmê Rehmî li sala 1950î çû Pakistanê, li wir Kongera Îslamî ya cîhanê hazir bû.

Wî bi zimanê kurdî – tirkî – erebî – farisî – almanî – rûsî dizani bû.

Berhemên wî 32 pirtûkên bi zimanê tirkî û 6 pirtûkên bi zimanê kurdî ne.

Evdirehîmê Rehmî li 9ê Sibata sala 1958an li Stembolê ji vê dinê bar kir. Rehma Xweda lê bibare.

Lê mixabin, nivîskarên Kurd ên ku kesayetiye Evdirehîmê Rehmî ya giring di wêjeya kurdî de bi bîr anîne pir hindik in.

Ev e nimhûnek ji helbestên wî:

Ey millete sahibnîfaq Lazim ji bo te îttîfaq
Tesîs nekin em yek wîfaq
Mehwiyyet e bîl îttîfaq
Aqilê xwe berhev kin hemî
Wext zeman pirr nazik e
Bêîttîfaqî tehlûk e
Xelqan hemî digel me rik e
Mehwiyyeta me bê şik e
Aqilê xwe berhev kin hemî
Şexsiyetê bavêne der
Yek şexsî şol nayête ser
Yek bin nemînit bê eser
Sola umîda me li ser
Aqilê xwe berhev kin hemî
Dest dêne yek şibê bira
Hilkin ji bo xwe yek çira
Riya ku tarî ye ji me ra
Ronahî lazim vê sira
Aqilê xwe berhev kin hemî

- - - - - - - - - -

* Ev helbesta di Kovara Jînê hejmar 5 sala (1334 hicrî/1915 zayînî) hatiye weşandin.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

**Êmêla Newrozê: Newroz@yek-dem.com**